K.T.

Zanîngeha Mêrdîn Ya Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bê Tez

# LI ÊLIHÊ CIHÊN PÎROZ

# (DU MÎNAK/ ZIYARETÊN SEYÎT BÎLAL Û QUBA ZÎLANÊ )

Mehmet ÖZCAN ELEFTOZ
14721087

Şêwirmend
Alk. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Ya Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bê Tez

# LI ÊLIHÊ CIHÊN PÎROZ

# (DU MÎNAK/ ZIYARETÊN SEYÎT BÎLAL Û QUBA ZÎLANÊ)

Mehmet ÖZCAN ELEFTOZ
14721087

Şêwirmend
Alk. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

## NAVEROK


**NAVEROK** ........ **I**

**PÊŞGOTIN** ........ **III**

**KURTE** ........ **V**

**ÖZET** ........ **VI**

**KURTEBÊJE** ........ **VII**

**DESTPÊK** ........ **1**

**1-Mijara Xebatê û Sînorên Wê:** ........ **1**

**2-Armanc û Girîngiya Xebatê:** ........ **1**

**3-Rê û Rêbazên Xebatê:** ........ **1**

**4-Pirsgirêkên Xebatê:** ........ **1**

**BEŞA YEKEM** ........ **2**

**FOLKLOR Û ÇANDA ZÎYARETÊ** ........ **2**

**1.2. Pênaseya Folklorê** ........ **2**

**1.1. Cihên Pîroz** ........ **2**

**1.3. Pênaseya Zîyaretê** ........ **2**

**1.4. Li Dinê Cihê Zîyaretan** ........ **3**

**1.5. Li Tirkîyê Cihê Zîyaretan** ........ **3**

**1.6.Sedema Serdana Ziyaretan** ........ **4**

**1.6.1. Ji Hêla madî ve:** ........ **4**

**1.6.2. Ji Hêla manevî ve:** ........ **4**

**1.7. Li Zîyaretan Pratîkên Ku Tên Kirin** ........ **4**

**1.7.1. Paç / Paçik Girêdan:** ........ **4**

1.7.2. Qurban Serjêkirin: .......... 4
1.7.3. Dia Kirin: .......... 5
1.7.4. Razan: .......... 5
BEŞA DUYEM .......... 6
ÊLIH Û ZÎYARETÊN ÊLIHÊ .......... 6
2.1. Pênaseya Elihê û Dîroka Wê .......... 6
2.2. Zîyaretên Li Elihê .......... 6
BEŞA SÊYEM .......... 7
DU MÎNAK JI ZÎYARETÊN ÊLİHÊ: .......... 7
ZÎYARETA SEYÎD BÎLAL Û ZÎYARETA QUBA ZÎLAN .......... 7
3.1. Zîyareta Seyîd Bîlal .......... 7
3.2. Ziyareta Quba Zîla(Şêx Mihemmedê Zîlla) : .......... 9
BEŞA ÇAREM .......... 12
ENCAM .......... 12
Çavkanî .......... 13
Kesên Agahî ji Wan Hatine Sitandin: .......... 15
PÊVEK: .......... 16
Ferhengok .......... 17
Nexşeya Êlih .......... 17

# PÊŞGOTIN

Di gelek dîn û baweriyên insanan de giringîya ziyaretgehan heye. Di nava misilmanan de ziyaretgeh cihekî gelekî girîng digirin. Bi taybetî di nav terîqet û tesewifê de gelekî xwedî roleke giranbiha ye.

Ziyaretgah, li ser gorên insanên ji aliyê terîqetê ve ku xwedî rûmet û pîroz têne dîtin ve tên çêkirin. Ên ku girêdayê wê terîqetê ne an jî mirovên ku baweriya wan bi ziyaretê tên diçin ser wan ziyaretgehan û wan mirovên ku ji wan re welî an şêx tê gotinê tewaf dikin.

Di dema ziyaretê de gazî û lavayan ji Xwedayê xwe dikin. Pêxember(a.s.v.), welî û şêxan li bal Xwedayê xwe dikin mehdervan. Bi rê û alîkariya wan ji Xwedayê xwe alikariyê dixwazin. Baweriyê tînin ku li dinya û axretê bi dia û lavayên wan, Xwedayê alikariya wan bike.

Pêgirtiyên van terîqet, şêx û ziyaretan bawerdibin ku hêz û tilsimên wan ên awarte hene. Ew bawerin ku ev şêx û ziyaret ên nexweş sax dikin, ên ku ji aliyê aborî ve ku di tengasiyê de ne digihêjine firaqetiyê. Bextê mirovan vedikin. Mirov dibine xwedî zarok. Gelek mirov li van ziyaretan qurbanan ser jê dikin. Li van ziyaretan tobe dikin dev ji kirinên xwe yên kirêt berdidin.

Di nav salê de di rojekê diyarkirî de bi navê cemaiyê pêgirtiyên wê ziyaretê wek mîhrîcanekê li hev dicivin. Ji binemala wê ziyaretê şêxê erkdar be xwarin ve xwarinê dide van pêgirtiyen xwe. Ew jî li gorî derfetên xwe diyariyan pêşkeşi şêxên xwe dikin. Şêxên xwe tewaf dikin dest û cilên şêxên xwe maçû dikin.

Mirovan di serpêhatiya jiyana xwe de her tim pêdivî bi spartingeha dîtine û xwe hin bi tiştên pîroz û efsûnî ve girêdane. Ziyaretgeh jî yek ji van spartingeha ye. Bi taybetî di çanda kurdan de Ziyaret, xwedî roleke gelekî girîng e. Li gelek deveran ziyaretgeh hene. Em ê jî ji van ziyaretgehan li ser ziyaretgehên; Seyîd Bilal û Quba Zilan teza xwe amade bikin.

Dema ku mamosteyê min ê rêzdar Alk. Doç. Dr. Necat KESKİN pêşniyara vê xebatê ji min re kir bikêfxweşî min ev pêşniyara wî pejirand. Min dest bi lêkolîna xwe kir û gelek çavkanî bi dest xistin û min ji gelek kesan pirsîn û bi berpirsên van ziyaretgehan re hevpeyvîn kirin.

Di vê xebata me de ji dest pêkê heta dawiya wê di her astê de ji ber ku alîkariya min, ez spasiyên xwe pêşkeşî Şêwirmendê xwe Birêz Alk. Doç. Dr. Necat KESKİN dikim. Di vê xebata min de her ku alikariya kê gihîştibe min ez spasiya wan dikim. Mala wan hezar car ava.

Hewildan li me, mirad ji Xwedayê mezin.

Êlih- 2018

# KURTE

Ev projeya di destê we de pêşniyaza mamosteyê me birêz Necat KESKİN e. Bi kurtasî ji bo cihên pîroz Ziyaret tê gotin. Armanca bingeh a fenomena ziyaretê xwe gihandina pîroziyê ye. Ziyaret di nav baweriya gel de wek stargeh tê dîtin. Gel ji bo gelek sedeman diçe serdana wan. Serdana ziyaretan di nav çanda gelê kurd de jî xwe nîşan dide. Ji vê xebatê mebesta me ewe ku, di çanda Êlihê de rola ziyaretan derbixê ber çavan. Di civaka Êlihê de ziyaret cihekî giring digirin gel ji bo gelek sedeman diçin ser ziyaretan wek daxwaz, nexweşîn, çêbûna zarokan, vekirina kismetê, rizq, debar, tirs, dua hwd. Ji ber ku dema me kurt bû me di vê xebatê de bi taybetî li ser du ziyaretan lêkolîn kir: Ziyaretên Seyîd BÎLAL û Quba ZÎLAN'ê . Projeya me ji sê beşan pêk tê.

**Di beşa yekem de**: Pênaseya Folklorê û zîyaretan, li dinê û Tirkîyê cihê zîyaretan, sedema serdana zîyaretan û pratîkên ku li zîyaretan tên kirin cih digire.

**Di beşa duyem de**: Danasîna Êlihê û zîyaretên li Êlihê cih digire.

**Di beşa sêyem de:** Zîyaretên Seyît BÎLAL û Quba ZÎLAN'ê cih digire**.** Beşa herî giring a vê xebatê ev beş e.

Di vê lêkolînê de kesên ku li wê derdorê dijîn bi awayî devkî agahî hatin kom kirin. Di zanyariya devkî de me bi çar kesan re hevdîtin pêk anî. Dengên van kesan hatin tomar kirin û paşê jî ev tomar hatin tesnîfkirin û nivîsandin.

**Bêjeyên Sereke:**
Ziyaret, Çand, Êlihê, Seyît BÎLAL, Pîroz

# ÖZET

Elinizdeki bu proje, Hocamız sayın Necat KESKİN'in önerisidir. Kutsal yerler için ziyaret kavramı kullanılmaktadır. Ziyaret fenomeninin temel amacı kutsala ulaşmaktır. Ziyaret halk inanışında manevi açıdan sığınma yeri olarak görülür ve bu yerler çeşitli beklentiler için ziyaret edilir. Bu durum Kürt kültüründe de kendini gösteriyor. Bu çalışmanın amacı Batman kültüründe ziyaretlerin önemini ortaya çıkarmaktır. Batman halk kültüründe ziyaretler önemli bir yer tutmaktadır. Bölge halkı kariyer, iş, hastalığa derman, korku, dua, sağlık, kader-kısmet, çocuk, vs isteklerle ziyaretlere başvurmaktadır. Bu çalışmanın amacı, ziyaretlerin önemini ortaya çıkarmaktır. Zamanımız kısıtlı olduğu için bu çalışmada özellikle iki ziyaret üzerinde durulmuştur: Seyît BÎLAL ve Quba ZÎLAN Ziyaretleri.

Bu çalışmanın;

**Birinci bölümünde**: Folklor ve ziyaret tanımı, Dünyada ve Türkiye‟de ziyaretlerin yeri, ziyarete gidilme sebepleri ve orda yerine getirilen ritüeller ele alınmaktadır.

**İkinci bölümde**: Batmanın genel tanıtımı ve ziyaretleri ele alınmaktadır.

**Üçüncü bölümde**: Seyît BÎLAL ve Quba ZÎLAN Ziyaretleri ele alınmaktadır. Çalışmanın en önemli bölümü budur.

Bu iki ziyaret hakkındaki bilgiler, ziyaretlerin çevresinde yaşayan ve belirli bir sözel belleğe sahip dört kişiyle yapılan mülakatlar sonucunda elde edilmiştir. Yapılan bu görüşmelerde bilgiler kaydedilmiş, tasnif edilmiş ve yazıya aktarılmıştır.



**Anahtar Sözcükler:**

Ziyaret, Batman, Kültür, Seyit BİLAL, Kutsal

# KURTEBÊJE

B.Z: Berî zayînê

P.Z: Piştî Zayînê

Hwd: Her wekî din

# DESTPÊK

## 1-**Mijara Xebatê û Sînorên Wê**:

Di vê xebatê de, em li ser du mînak ziyaretên li Êlihê sekinîn û navê xebata me “Li Êlihê Cihên Pîroz- Du Mînak: Ziyaretên Seyît BÎLAL û Quba ZÎLAN in. Ev ziyaret yek li navçeya Êlihê ya Qercewsê dimîne. Em bi hûrgilî li ser van ziyaretan sekinîn.

## 2-**Armanc û Girîngiya Xebatê**:

Ziyaret di civakê de ji aliyê çand, aborî, kesayet, derûnî, civakî û hwd. cihekî girîng digrin. Armanca me ev e ku di civakê de şûna ziyaretan, hêvîdariya kesên ku serdana wan ziyaretan dikin û di dema serdanan de rîtuelên ku tînin cih û hwd. li ser sekinîn e. Girîngiya van ziyaretan ev e ku li Êlihê ziyaretên navdar in û ji aliyê Seyidbûna wan ve xwediyê cihekî giranbûha ne.

## 3-**Rê û Rêbazên Xebatê**:

Di vê xebatê de ji aliyê teorîk ve xebatên dokumantasyon, di xebatên qadî de jî bi rêbazên hevpeyvînê me agahî bi dest xistin.

## 4-**Pirsgirêkên Xebatê**:

Xebatên ku li ser vê qadê tên kirin, bi piranî bi rêbaza hevpeyvînê ne. Xebatên nivîskî gelekî kêm in. Kesên ku li ser ziyaretan zanyariyên xwe hebin, gihiştina wan gelekî zehmet e. Ji aliyê din ve zanyariyên ku bi dest dikevin dibe ku hev negrin. Ji aliyê din ve jî leheng, mijar, taybetiyên ziyaretan gelekî nêzî hev in. Ev xal, ji bo xebatê pirsgirêkan derdixin holê.

# BEŞA YEKEM

# FOLKLOR Û ÇANDA ZÎYARETÊ

## 1.2. Pênaseya Folklorê

Folklor, zanista gel e, malê gel e. Di nav gel de çanda maddî û manewî li gorî hin rêbazan lêkolîn kirin, berhev kirin, tesnîf kirin, tehlîl kirin û nirxandin e. Li gor Celadet Elî Bedirxan folklor, ‘’zanîn an zanistiya xelkê ye.‟ (Yıldırım&Aslan&Pertev 2013: 11) Di nav vê zanistiya gel de jî "pratîkên" ku gel bikartinê jî cihekî girîng digirin. Yek ji wan pratîkan jî serdana cihên pîroz e ku bi baweriyên gel ve girêdayî ne.

## 1.1. Cihên Pîroz

Pîroz ew e ku ji aliyê olî ve pêwîste ku rêzdariyêke bi hêz jê re were dîtin, destwerdanê re qedexe ye û nirxên ku pêwîst e were parastin e. (www.emakalat.com) E. Durkheim li ser pênaseya pîrozê wiha dibêje: ‘’Tiştên pîroz tenê ne xwedê û tîn e. Zinarek, darek, kaniyek, kevirekî piçûk, malek hwd. hema her tişt dibe ku pîroz bibe.( Arslan: 2015) Bi piranî pîroz, ji aliyê olî ve tê dîtin an jî pîroz û ol peyvên nezî hev tên dîtin.’’Cihên Pîroz‟ di nav gel de cihekî girîng digrin. Him ji aliyê olî ve him jî ji aliyê çandî ve rûmeteke xwe ya giranbuha heye. Di nav ol û mezheban de kes an jî cihên pîroz çavkaniya ziyaretan e. Cihên ku nirxên gelan temsîl dikin di nav gel de tên parastin û jê re rêz tê gitrin. Di olên Xwedayî de peyvên pîroz, an jî cihên pîroz gelek in. Wek mizgeft, dêr, Mekke, Medîne, Roma, Kudüs, ziyaret, hwd. karin werin dîtin.

## 1.3. Pênaseya Zîyaretê

Peyva “ziyaret”ê, ji zimanê Erebî derbasî zimanê Kurdî bûye. Ji peyva Erebî ya ‘’zewr‟ ê derketiye holê. Wateya Ziyaretê serdan, serlêxistin e. Serdana kesekî/ê ango deverekê, tiştekî ye. (Atasağun: 2006)

Mirovahiyê di destpêkê de tiştên ku nikaribûye bi nav bike, yan bi tirsê yan jî pîroziyê nêzî wan bûye. Tiştên ku qewimîne û mirov tê negiheştine di wateya wan, an bi tirs an jî bi dil serê xwe tewandine. Li hember tiştên ku serê xwe ditewînin carinan mirovên qenc, ewlîya carinan jî tiştên wekî riwek, nebat, ajal bûne.

Ewlîya û mirovên qenc bi vê rê û rêbazê payeyên bilind bi dest xistine. An jî peyrew û xelefên van kesan payeyên bilind bi dest xwe xistine. Di civakê de jî ev tirs û pîrozî belav bûye û bi vê encamê ziyaret li her derê derketine holê.

### 1.4. Li Dinê Cihê Zîyaretan

Di bawerî û civakên xeynî îslamê de jî cihên pîroz wek ziyaretan hene. Ser dana van ziyaretan ji bo mensûbên ew bawerîyan cihekî girîng digire. Di cihû, xirîstîyan, pûtperest, hîndû û bûdîst de jî cihên wekî ziyaretan tên dîtin. Di nav cihûyan de ser dana gora pêxember û qencan, kevnoşopiyek belavbûyi ye. Gora zebul, Rabbi Meir, Davud, Nahum, Ezra, Daniel ji wan çend hebin.(Güç 1999: 126) Di nav xirîstîyanan de deverên ku Hz. Îsa, Hz. Meryem û E’zîz lê jiyane an jî wisa tê bawer kirin deverên pîroz in. Wek Qudis, Beytullahîm, gora E’zîz petrus, pavlus cihên pîroz ên sereke ne.(Erbaş 2002: 111) Li welatê Çînê cihên rahîbên bûdîst pîroz tên dîtin.

### 1.5. Li Tirkîyê Cihê Zîyaretan

Li Tirkîyeyê berî ola îslamê ol û baweriyên wekî Budîzm, Zerduştî, Maniheizmî, Mazdekî, şamanî, Xirîstîyanî, Yahûdî, Pûtperest, Êzidî jiyanê. Ku di dema Hz. Omer de Îslamiyet kete nav Anatolyayê û Mezopotamyayê baweriyên ku me li jor behs kirî bi awayekî li vê erdnigariyê dijîyan. Gel û civakên vê erdnigariyê ku derbasî îslamiyetê bûbûn jî, ol û baweriyên xwe bi giştî li paş xwe nehiştin. Bi awayekî, rîtuel û îbadetên xwe domandin. Ev rîtuel û îbadet pir caran xwe li ziyaretan dide xûyakirin. Cihên pîroz, gorên bav û kalan, ewlîya û hwd. di nav civak û gel de jîyana xwe domandine. Di nav baweriya xirîstîyanî de cih û kaniyên pîroz wek ziyaret hatine dîtin û ev bawerî derbasî civakên Misliman jî bûye. Dîsa li ser ziyaretan find vêxistin jî ji baweriyên din derbasî ola îslamê bûne (Çelik 2013: 21).Tirkîye ji aliyê ziyaretan ve ciheki pir dewlemend e. Li kîjan deverê mirov binêre, li wê deverê cihên pîroz dibîne. Erdnînagariya Anatolyayê cih û warê ‘**miriyên nemirin**’.(Altun: 2008) Li Tirkiyeyê bi hezaran-deh hezaran ziyaret hene. Di sala 1925‟an de ku bi zagonekê tirb, ziyaret û tekke hatine girtin jî, di 1950‟î de qedexe rabûnê û dîsa ziyaret geş bûne.

## 1.6. Sedema Serdana Ziyaretan

### 1.6.1. Ji Hêla madî ve:

Yên ku ji bo berjewendiya madi bidestbixin diçin cihên pîroz rasterast tiştekî madî naxwazin, daxwazên xwe yên bingeh ji xwedê re pêşkeş dikin. Lê belê cihê ziyaretê ji bo daxwazên wî qebul bibin wek navber dibînin. Lê belê carinan cihê ziyaretê yan jî yê ku li wê derê radizê dikeve pêş û rasterast alikarî jê tê xwestin. Ha di vî xalî de pratikên wek paç, paç grêdan, qurban serjêkirin, zeliqandina kevirên xwestekê, Find Vêxistin hwd. derdikevin holê.(YEĞİN :2015)

Bi gelemperî di nav xwestek û duayan de ji nexweşiyan re şifa, xwestina zarokan, sekinandina zarokên nerehet, vekirina kısmetê, mal-milk, kar, rizgariya exlaqên nebaş hwd.

### 1.6.2. Ji Hêla manevî ve:

Hin kesên ku cihên pîroz ziyaret dikin mebesta wan ne madi ye, tenê li wir dua kirin, ji xwedê re lava kirin û standina feyzeke manevi ye. Ev kesên ha li ziyaretê pratikên wek qurban, gazî, paç grêdan hwd. nakin û li van cihan nimêj jî nakin. Fatihayek û sê ixlas dixweynin û xêra wan sureyan jî dixwazin xwedê bigihîne ji tînê şexsên yê ku li wê derê radizê. (Atasağun: 2006)

## 1.7. Li Zîyaretan Pratîkên Ku Tên Kirin

### 1.7.1. Paç / Paçik Girêdan:

Bi gelemperî li ber ziyaretên weliyan dar heye. Ziyaretvan, ji bo daxwaziyên xwe bînin bîra wî zatê ku li wir radizê, bi şaxên darê ve paçik girê didan. Carinan jî, ji potikan dergûş çedikirin û pê ve grê didan. Hin kes jî bizmar li qurmê darê dixin (Karakaş 2014: 171).

### 1.7.2. Qurban Serjêkirin:

Gel Wusa bawer dike ku ger li ser ziyaretan qurban serjêbikin, ê daxwazên wan zutir qebul bibin. Ev rîtuel di baweriyên berê de jî hebû, wexta ku civak diket tengasiyê ji bo daxwazên wan zu qebul bibin li cihên pîroz qurbanê xwe ser jêdikirin.(KOÇ 2008: 25)

1.7.3. **Dia Kirin**:

Kesên ku li ziyaretan radizên, dibe ku diayên ku tên kirin re bibin alîkar û ev diayên ku têne kirin ji aliyê xwedê ve qebûl bibin. Civak, li gor baweriya xwe wan ziyaretan dike navbeynkar (Atasağun: 2006).

1.7.4. **Razan**:

Bi taybetî yên ku ji aliyê derûnî ve nexweş dikevin, wexta ku li ber tirbê radizên, wusa tê bawerkirin ku ew qencê xweda ê bên xewna wî û ê baş bibin.

# BEŞA DUYEM

# ÊLIH Û ZÎYARETÊN ÊLIHÊ

## 2.1. Pênaseya Elihê û Dîroka Wê

Her çi qas Êlih bajarek nû be jî piştî xebatên şunwarnasiyên van salên dawîn derketiye holê ku dîroka Êlih û derdora wê digihîje 10 hezar sal berî zayînê.(ÇELİK 2008: 245) Di dîroka Êlihê de wekî devletên Hurî, Mîtanî, Asur, Urartu, Îskît, Med, Pers, Îskenderê Makedonyayî, Bîzans, Emevî, Abbasî, Eyyubî, Selçûkî, Artukî, Karakoyunî, Akkoyunî serdest bûne piştre jî di dema Selîmê yekem ê padîşahê Osmanî de ketiye bin hikma Osmaniyan.(Tuncel 1993: 200) Di dema Osmanîyan de girêdayê eyaleta Diyarbekirê bû.(Uzunçarşılı 1998: 273) Dema Komara Tirkiyê de Elihan an Elehan gundekî girêdayî navçeya Elmedina ya bajarê Sêrtê bû.1935an de wexta ku lehî radibe û Elmedina ji nexşeyê jê dibe. Êlih girêdayê navçeya Qubînê dibe. Ji ber ku li ber Çemê Batmanê bûye bi tirkî navê wê kirine ''Batman'' Di 16'ê Gulanê yê 1990an ji bajarê Sêrtê veqetiyaye û bûye bajar.

Navçeyên bajêr ev in: Kercews(Gercüş), Hezo(Kozluk), Sasun(Sason), Heskîf(Hasankeyf), Qubîn(Beşiri)

## 2.2. Zîyaretên Li Elihê

Di nav civaka kurdan de ziyaret cihekî giring digire û serlêdana welî, qenc, ewliya û hwd. kevnoşopiyeke giring e. Şekilgirtina jiyana çandî û baweriya Êlihê de rola ziyaretan giring e.

Ev zîyaret ji aliyê gel ve pirî caran bûne nirxên mezin û wan ji perçeyên xwe dihesibînin. Bajarê Êlihê (bi taybet navçeyên wê) jî wekî her bajarî ji aliyê ziyaretan ve dewlemend in.

Ziyaretên ku heta niha hatine tespît kirin ev in: Ziyareta Quba Zîla(Hezo), Ziyareta Kanîrewa (Qubîn), Ziyareta Seyît Bîlal (Kercews), Ziyareta keçika Bagasê (Kercews), Ziyareta Şêx Yakup(Kercews), Ziyareta xavs Şêx Halîl(Kercews), Ziyareta Şêx Ahmet(Kercews), Ziyareta Şêx Atman(Kercews), Ziyareta Zembil Firoş(Hezo), Ziyareta Banika Kezîzera(Kercews), Ziyareta Şêx Bazîd(Sasun), Ziyareta Êzîdiya(Qubîn), Ziyareta Kanîrewa(Qubîn).

# BEŞA SÊYEM

# DU MÎNAK JI ZÎYARETÊN ÊLİHÊ:

# ZÎYARETA SEYÎD BÎLAL Û ZÎYARETA QUBA ZÎLAN

Erdnigariya Anatolyayê û Mezapotamyayê, bawerî û dînên pircure re mêvantiyê kirine. Di nav baweriyên pircure, nirxên pîroz û çandên cuda de bi sedsalan hevbandorî çêbûye. Anatolya û Mezapotamya di dîroka mirovahiyê de yek ji axên herî rengîn û giring in. Li rasthatina ziyaretên li her çar aliyên vî erdnînariyê jî ifadeyên jorê piştrast dike. Wusa tê bawerkirin ku ziyaretên herî kevn ên Anatolya û Mezapotamyayê, aîdê kesên ku seferên ji bo fetîh û belavkirina misilmantiyê de qehremanî, keramet û fazîlet nîşan dane ne. Ev kes bi gelemperî sıhabe û rêhevalên wan bûn. Gel ev kesên ku ji bo armencek pîroz şehid bûne wek ziyaret qebul kirine. Pişt van re jî nûnerên tarîqatan, şêx, pîr(dede), bav(baba) tên. Tiştê balkeş ev e ku pirî van kesan grêdayî tarîqatekî ne.(Atasağun 2006)

## 3.1. Zîyareta Seyîd Bîlal

Weke tê zanîn ku ji bo malbata Hz. Pêxember ‘’Ehl-i Beyt’’ tê gotin. Ev malbat ji Hz. Êlî û Hz Fatima dewam dike. Yên ku ji nifşên Hz. Hesen tên re Şerîf tê gotin. Yên ku ji nifşên Hz. Huseyîn tên re jî Seyîd tê gotin.(Adak:2004) Ev nifş bi Şecere-î Tayyibe(malbata pak) tê binavkirin. Civak pir qîmet dide van kesan û ji alî aborî û civakî ve kesên bijarte ne.

**Dîrok û Çîroka wî**: Li ser çîroka hatina Seyîd Bîlal çend varyant hene yek ji wan ev e: Di dema Harun Reşidê xalîfeyê Ebbasiyan de fermana seyîdan derdikeve, yên ku tên girtin an wan dikujin an jî wan radigrin. Ji ber ve rewşê Seyîd direvin heremên cuda.(Adak:2004)

Emin Bulut (Endamê Lijneya Rêveberiya Weqfa Seyîd Bîlal) di hevpeyvînê de çiroka Seyîd Bîlal wuha neqil dike: Seyîd Bîlal di sala 1132’an de li Bexdayê hatiye dinê. Navê bavê wî Seyîd Harûn û navê diya wî Fatima ye.

Di dema Harûn Reşid de li Bexdayê fermana seyîdan derdikeve û hemû seyid direvin. Seyîd Bîlal jî vê demê ji Bexdayê aliyê mezopotamyaya jorê ve diçe û tê herema Mîrê Botan. Li ser Girê Beş nimêja xwe dike. Di wê gavê de begê E’reban jî derketiye nêçîrê. Di wexta nêçîrê de

tajiya beg bi bergerî pey kevroşkekî datîne, kevroşk jî xwe disipêre Seyîd Bîlal ku ew li ser nimêjê ye. Tajî cihê xwe disekine û êrişê kevroşkê nake zilamên mîr vê rewşa balkeş ragihandine mîr. Mîr hatiye û ji Seyîd Bîlal pirsiye tu ki yî, ji ku tê yî û tu yê herî ku derê? Seyîd Bîlal bersiv daye û hatina xwe ya ji Bexdayê û sedemên koçberiyê vegotiye. Seyîdiya xwe jî diyar kiriye. Begê E'rebanê jê dipirse 'tu ji min çi dixwazî ?' Seyîd Bîlal bersiv dide 'Ez tiştek naxwazim, tenê wan wêraneyan bide min.' Mîr, herema di navbera heft giran de ye nişan dide û jê re hîbe dike û piştre dibêje ku tu bê cirm î ji ber vê, navê wir bûye Bêcirman(vergisiz). Xwişka xwe Fatima jî bi Seyîd Bîlal re dizewcîne. Ji vê zewacê heft kur çêdibin. (Elî, Haşîm, Îsmaîl, Mîrza, Mûrad, Kiliç, Nasreddîn) 1212'an de Seyîd Bîlal rehmet dike.

Herêma cihê ku gundê Bêcirman dimîne, dikeve nav herema Torê. Bêcirman di erdnîgariya kurdan de, ji ber ku navendeke giring ên Seyîdan bû ji ber vê Mîrê Botan şêniyên wî gundî ji bacê muaf girtiye. Ev nav(Bêcirman) di dema Selçûkî û Osmaniyan de jî didome. Di dema Osmaniyan de qiymeteke mezin dane Seyidan û ji bo wan qeyd bikin di dema Beyazidê yekemîn(Yıldırım) de rêkxistinek bi navê ''naqibu'l-eşrafî'' ava kirine. Wexta ku Komara Tirkiyeyê ava dibe navê heremê didome ev nav di 1968'an de weşana bi navê Gundên Me (Köylerimiz) ku ji aliyê Wezarata Navhundirîn ve derketiye de xwuya dike ku bi navê 'Vergili' hatiye guhertin. 1959'an de li gor pêwistekî biryara ku hatiye standin, navên gelek gundan ku navê Bêcirman jî tê de ye hatine guhertin. 2014'an de di nav qanunên demoqratîkbûnê de ku çarçoveya pêvajoya çareseriyê de derdiket de hatiye guhertin û nav dîsa bûye Bêcirman û ji aliyê Wezîrê Maliyê Mehmet Şimşek ve, ku ew eslê xwe ji Kercewsê ye, tabeleya Bêcirman hatiye daleqandin. (Keskin:2014)

Ziyareta Seyît Bîlal, li gundê Bêcirman a navçeya Kercewsê ya Êlihê ye. Seyîd Bîlal bavikê seyîdên Bêcirmaniya ye. Her sal bi deh hezaran zîyaretvan tên serdana zîyareta Seyîd Bîlal û ev pêwendî jî navçeya Kercewsê dike wek navenda geşta baweriyê. Her sal êvara în a hefteya duyem a meha Îlonê de ji bo bîranîna Seyîd Bîlal çalakiyên bi navê 'Zêw'ê tên lidarxistin. Yên ku ne Bêcirmanî bin jî beşdarî vê çalakiyê dibin tiştê balkeş ev e ku ne tenê misilman şexsên baweriyên din wek Suryanî û Êzidî jî beşdarî vê 'Zêw'ê dibin. Li gor tê naqilkirin ku peyva 'Zêw'ê ji Êzidiya hatiye standin. Zêw, salê carekî, cihekî û wextekî diyarker de li ser navê kesê ku miriye, lidarxistina merasîma malovaniyê ye. Li Rojhilata Başur ya Tirkiyeyê Zêwa herî navdar ya Seyîd Bîlal e. (Adak:2004) Ev çalakî wek mîhrîcanek, şahiyek dihat pîrozkirin. Bi kemençeyên mirtiva govend dihat girtin û gel kêf û şahî dikir. Di nav buyerên Zêwê de tiştê herî balkeş eve ku keç û kurên xort ên dixwazin

bizewcin, di roja Zêwê de li hev dihatin û direviyan. Ev tevger di demeke asayî de bûna, ê şerê xwînê derxistibûna lê belê ji bo xatirê Seyîd Bîlal û Zêw'ê dihatin bexşandin. E'şîrên di nav şer de bin jî agirbest îlan dikirin. Zêw êvara înê dest pê dikir û roja înê diqediya. Piştî salên 1980'an çalakiyên Zêwê ji aliyê Şêx Xelîl ku li heremê şêxekî navdar bû ve ji ber ku ne li gora dînê Îslamê bûye hatiye qedexekirin.(Keskin:2014) Piştî salên 2000'an ev çalakî dîsa dest pê kiriye lê belê ne wek berê, li gor esasên dînî hatiye li darxistin.

Ziyaret di nav goristaneke de ye û du deriyê ketinê hene: yek ji bo mêr yê din jî ji bo jinan e. Derdora tirbê qilfê tiliyê ji hesin ve hatiye girtin. Di nav avahiya tirbê de hin gorên din jî hene. Rîtuelên vê ziyaretê ev in: Bi taybetî kesên ku hişên wan ji wan diçin tên ser vê ziyaretê li gor baweriyê ew kesên ku pirsgrêkê derûnî li wan çêdibin rojek li ber tirbê radizên, Seyîd Bîlal tê xewna wan û ew kes tên ser hişê xwe û baş dibin ev rîtuel ne tenê ji bo nexweşînên derûnî wexta ku ji hin nexweşînan re tib çare nabîne ew kes jî tên serdana ziyaretê(wek bîrov,qansêr). Hin kes ji bo daxwaziyên wan bi cih bibin bi daran(ku tê gotin ew dar 400-500 salî ne) ve paç grê didin. Hin kesên ku ji derdorê tên qurbanan serjê dikin. Hin kes axa li ser gorên derveyî tırbê pîroz dibînin û radijin. Yên ku zarokê wan çênabin ji potik derguş çêdikin kevirek biçûk dixin nav û bi qilfê tiliyê ji hesin ve grê didin. Hin kes jî di nav avahiya ziyaretê nimêj dikin, qur'an dixwînin.

Ji aliyê gelê heremê ve jî Ziyareta Seyîd Bîlal cihekî girîng digre û gel rêzdarî û hurmeteke mezin hem jê re hem jî seyîdan re nişan dide. Yên ku tên ziyaretê yan jî beşdarê çalakiyên Zêw'ê dibin, ji aliyê derûnî ve huzûr dibînin. Sedema ev rêzdarî û pêwendiyê, ne tenê kerametên wî û jê sûd wergirtine. Sedema herî giring rola wî ya di nav civakê de ye. ji ber ku xebatên Seyîd Bîlal li ser aşîtiyê bûn ew di nav civakê de huzûr, ewlehî û e'daletê temsîl dikir. Navê wî li ser ev rola wî belav bûye. Seyîd Bîlal hem di nav eşîrên kurdan hem jî di nav misilman, îsevî(suryanî) û êzidiyan de wek hêmanê miwazeneyê cih girtibû.

### 3.2. **Ziyareta Quba Zîla(Şêx Mihemmedê Zîlla)**

Ziyaret li gundê Zîlanê yê grêdayî navçeya Hezo ye. Ziyaret 30 km dûrî Êlihê ye. Ziyaret di nav goristanekî de ye. Navbera wê û Hezoyê 22 km ye. Malbata Zîlla di sala 1290'an de ji gundê Zîlla yê Bexdayê hatine heremê. Ev malbat pêşî koçber bûn piştî ku karê xwe yê îrşadê bi cih dianin, piştre vedigeriyan Bexdayê. Sedema hatina wan ev e ku wexta fermana Seyidan derdikeve ew jî wek Seyidên din direvin û tên heremê. Ji aliyê Mîrê

Meyyafariqînê ve ji bo malbata Zîlla bicîh bibin, herema ku wê çaxê navê wir Bella bû, ji wan re hatiye hîbekirin.

Ziyareta Şêx Mihemmedê Zîlla, ji aliyê şêx E'lî ve hatiye avakirin û li gor riwayetê hosteyê qubbê jî filleh bûn. Avahiya tirbê bi keviran û xerca wê jî bi kils û casê hatiye çêkirin. Ziyaret salek piştî wefata Şêx Mihemmed hatiye avakirin. Piştî ku ziyaret ava bûye şêx E'lî ji bo vekirina ziyaretê malovaniyek dide feqî û gundiya. Ev malovanî wek kevneşopiyek her sal didome. Ev malovanî di meha gulanê de 3 caran dihat dayîn. Îna yekem a gulanê de ji bo gelên nêz, gundî û feqiyan malovanî dihat dayîn. Îna navîn a gulanê ji bo gundê derdorê dihat dayîn. Îna dawî a gulanê jî, ji bo gelên amedê heta bedlîsê, mêrdîn heta sêrtê dihat dayîn. Ev kevnoşopî heta salên 2000'an didome piştre ji hin sedeman dev jê berdidin. Piştî salên 2000'an, yên ku tên serdana Ziyaretê, xwarina xwe bi xwe re tînin an jî li wir çêdikin û hem dixwin hem jî bela dikin. Ji xwe derdora ziyaretê wek seyrangehek hatiye avakirin.

Gelên ku tên serdana ziyaretê bi gelemperî armanca wan ev in: ji bo nexweşîn(derûnî), ji bo zarok, ji bo girtiyan, ji bo eskeran hwd. Rîtûelên ziyaretê ev in: Kevir zeliqandin, çapût grêdan, razan, rahiştina axê (li gor tê riwayetkirin hin kes wê axê dixwin, hin kes ji bo bibe derman li canê xwe didin, hin kes wê axê dixin nav nivîştê davêjin stuyê xwe hwd.) Hin kesên ku tên serdana ziyaretê, zincîra ku bi jora qubbê ve grêdayi ye bi xwe dilefînin. Wusa tê bawerkirin ku kesên ku ji vira ve sond bixwin ew zincîr dikeve qirka wan û dixeniqin.

Gelên heremê, hirmet û rêzdariyeke mezin ji ziyaretê re nîşan didin. Sedema herî girîng eve ku malbata şêx, şert û mercê îslamê anîne vê heremê û di tekên xwe de xortên heremê perwerde kirine. Ji wan xortan alimê baş derxistine. Wusa tê neqilkirin ku şêx mihemmedê Zîlla, ji mirtivek ku navê wî Hesen bû melekî baş derxistiye. Sedemek din jî keramet in. Kerametê ku ji aliyê wan ve hatine nîşandan hin kes ew bi çawên xwe dîtine piştre di nava gel de wek menqibeyek belav dibe û ji ber vê gel pêwendiyek mezin nîşanê wan dide. Wusa tê neqilkirin pîrekek li gundê mîlika welidiye û piştre cin giştinê; gundiyan, bi rê dikevin ku jinikê bibin nexweşxanê. Wexta ku diçin heta seriya rê, birayê wê dibêjin ka em wê bibin ser tirbê, wexta ku berê jinikê didin aliyê tirbê bêhna wê derdikeve. Gava tên ber tirbê jinikê dixin nava tirbê û derî li ser digirin. Heta ku çixarekî dikişînin ji hundur deng tê, jinik dibêje: derî vekin wexta ku derî vedikin dibînin ku jinik hatiye ser hişê xwe û ji wan re gotiye zarokê min li mal digirî min bibin malê.

Yek din jî ev e: Wexta ku Tevgera Qibrisê ji aliyê Tirkiyê ve hatiye lidarxistin, mîralayek tê gundê zîlanê xwe dide naskirin dibêje ez leşkerim û dixwazim herim ser dana ziyaretê. Mîralay di operasyona bombebaranê de tiştê ku hatiye serê wî vedibêje. Mîralay dibêje ku

wexta bombebaranê de mazota min qediya bû min dixwest ku vegerim, wê çaxê yekî destê xwe li pişta min xist û wusa got: Here careke din jî bombe bavêje bila îslam di destê kafiran de neçe, min jê re got ku mazot nemaye ez nikarim vegerim, wî ji min re got, ez ji te re dibêjim here mazota te hê ji nîv depoyê zêdetir e. Ez li nîşanderê dirênim ku mazot nemaye lê belê me dewam kir û bombeyê berda û em vegeriyan. Min jê pirsî tu ki yî, ez dixwazim te nas bikim ji min re got ku ez şêx Mihemmedê zîlî me, ziyareta min li ber pira badê ye.

# BEŞA ÇAREM

# ENCAM

Fenomena ziyaretê, têkiliya însan a bi pîroziyê re ye. Ev fenomena ku koka wê diçe heta kûrahiya dîrokê, di nav hemu ol û baweriyan de wekî nirxên hevpar, bi awayên cuda xwe nîşan dide.

Ziyaret, di nav ol û baweriyan de cihekî girîng digrin. Bi gelemperî Mezopotamya bi taybetî jî Êlih ji aliyê ziyaretan ve dewlemend e. Gelên Êlihê, rûmeteke mezin didin ziyaretan û cihên wan wek navenda pîroziyê dibînin.

Kesên ku diçin serdana van ziyaretan, kesên di ziyaretan de radizên rêzdar dibînin. Wusa bawer dikin ku ew kesên li wir radizên, evdên xweda yên bijarte ne. Ji ber vê wusa tê bawerkirin ku ji bo xatrên van qencên bimbarek, xweda ê diayên wan kesên ku tên ser ziyaretan qebul bike.

Gel ji bo hin daxwazî û hêviyan diçin serdana ziyaretan. Pêdiviyên mirovan pir cure ne. Sedemên serdana ziyaretan ev in: Nexweşîn, çêbûna zarokan, kar, mal-milk, oldarî, aramî, bîranîna mirinê hwd. Kesên ku diçin serdana ziyaretan, wusa bawerdikin ku ger hin rê, rêbaz û rîtuelan bînin cîh, ê ji van cihan sûd wergirin. Rîtuelên ku di van ziyaretan de tên kirin ev in: Dia kirin, qurban serjê kirin, paçik girêdan û razan.

Her çiqas hin rîtuelên ku di van cihên pîroz de tên kirin ne li gora dînê îslamê be jî gel, ziyaretan ji bo tegihiştina xweda de wekî pirekî dibînin.

Gelên Êlihê, Seyîd Bîlal û Şêx Mihemmedê Zîlan wekî kesên pîroz dibînin. Di nav gelên Êlihê û van kesên rêzdar de pêwendiyeke girîng heye lewra ev qencên xwedê di jiyane xwe de, ji bo belavkirin û hînkirina îslamê de xebatên mezin nîşan dane.

# ÇAVKANÎ

ADAK, Abdurrahman, Güneydoğu Anadoluuda Seyitler, **Marife,** 2004, Sayı 3, s. 383-395

ALTUN, Işıl, Kocaeli'de Türbelerle İlgili İnanış ve Uygulamalara Örnek:''Sultan Baba'', **Ankara Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi**, 2008, sayı 37,

ARSLAN, Mustafa, Kutsal ve Seküler Arasında: Hıdırellez ve Türbe Kültleri Çerçevesinde Gelişen Eğlence Kültürü, **Birey ve Toplum**, Güz 2015, Cilt 5, Sayı 10 Malatya.

ATASAĞUN, Galip "Ziyaret Fenomeni", **Selçuk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi**, 2013, 21: 33-66.

ERBAŞ, Ali, İslam Dışı Dinlerde Hac, **Sakarya Üniversitesi İlahiya Fakültesi Dergisi**,2002, sayı:5, s.97-121

ÇELİK, Ayşe Aysun, **Türbe Mekânı, Türbe Kültürü**, Yüksek Lisans Tezi, 2013, İstanbul

ÇELİK, Kemal, Cumhuriyet Döneminde Batman ve Yöresi, **I.Uluslar arası Batman ve Çevresi Tarihi ve Kültürü Sempozyumu-Bildiriler-II**, Batman, 15-17 Nisan 2008, s.a. 244-258

GÜÇ, Ahmet(1999). **Dinlerde Mabet ve İbadet**. İstanbul

GÜNAY, Ünver, Ziyaret Fenomeni Üzerine Bir Din Bilim Araştırması-Kayseri Örneği. Kayseri: **Erciyes Üniversitesi Matbaası**, 2001

KARAKAŞ, Rezan, Siirt Halk Kültüründe Kutsal Ağaç ve Türbeler, **Milli Folklor Dergisi**, 2014, sayı102, s.171

KESKİN, Necat, **Akışkan Kimlikler: Etnik ve Dini Kimlik Arasında Becirman Seyitleri**, Ankara, 2004, Doktora Tezi

KOÇ, Adem, Kütahya Soğukçeşme Köyünde Kurban Ritüeli, Dumlupınar Üniversitesi **Sosyal Bilimler Dergisi**, 2008, sayı 20, s.25

TUNCEL, Metin, '' BATMAN'', **Diyanet İslam Ansiklopedisi** V, İstanbul, 1992, s.200

UZUNÇARŞILI, İbrahim Hakkı, **Osmanlı Tarihi** II, Ankara, 1998,

YEĞİN, Hüseyin İbrahim Türbe Ziyaretlerinin Psiko-Sosyal Sebepleri: Hayrettin Tokadi Türbesi, AİBÜ **Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi**, 2015, Cilt 15, sayı 1

YILDIRIM, Kadri&PERTEV, Ramazan&ASLAN, Mustafa, 2013, **Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî**, Stenbol: Berdan,

## Malper:

-www.emakalat.com

-https://becirman1.tr.gg

-Dicle.life

-Batmanilkültürenvanteri.org

## **Kesên Agahî ji Wan Hatine Sitandin**:

Nav û paşnav : Emin BULUT

Cih û Temen : Êlih- 45

Asta perwerdehiyê : Zanîngeh

Navnîşan : Êlih

Dever : Êlih

Mêjûya berhevkirinê : 2017

Nav û paşnavê berhevkar : M. Özcan ELEFTOZ

Nav û paşnav : Muzaffer TÜZÜN

Cih û Temen : Mîlikan-53

Asta perwerdehiyê : Seretayî

Navnîşan : Mîlikan

Dever : Mîlikan

Mêjûya berhevkirinê : 2017

Nav û paşnavê berhevkar : M. Özcan ELEFTOZ

Nav û paşnav : Emin TURAN

Cih û Temen : Êlih- 37

Asta perwerdehiyê : Zanîngeh

Navnîşan : Êlih

Dever : Êlih

Mêjûya berhevkirinê : 2017

Nav û paşnavê berhevkar : M. Özcan ELEFTOZ

Nav û paşnav : Ahmet TÜZÜN

Cih û Temen : Êlih

Asta perwerdehiyê :

Navnîşan : Êlih

Dever : Êlih

Mêjûya berhevkirinê : 2017

Nav û paşnavê berhevkar : M. Özcan ELEFTOZ

# **PÊVEK**:

**Fotograf/ Sûret**

**18**

**Sûret-1** Hundirê Ziyareta Seyîd Bîlal 1

**Sûret-2** Hundirê Zîyareta Seyîd Bîlal 2

19

**Sûret-3** Hundirê Zîyareta Seyîd Bîlal 3

**Sûret-4** Paç/ Paçikên li Ziyareta Seyîd Bîlal

20

**Sûret-5** Ji Derve Zîyareta Seyîd Bîlal 1

**Sûret-6** Ji çalakiyên Zêw’ê

21

**Sûret-7** Hundirê Zîyareta Quba ZÎLAN 1

**Sûret-8** Hundirê Zîyareta Quba ZÎLAN 2

22

**Sûret-9** Ji Derve Zîyareta Quba ZÎLAN

**Sûret-10** Ji Dûr ve Zîyareta Quba ZÎLAN

## FERHENGOK

Lava kirin: Dia kirin

Nivîstek: Kîtabe


Mehdervan: Şefeatker

Cas: Kils

Peyrew: Ardil

Malovanî: Mazûvanî

## NEXŞEYA ÊLIHÊ





**Sûret-1** Hundirê Ziyareta Seyîd Bîlal 1



**Sûret-2** Hundirê Zîyareta Seyîd Bîlal 2



**Sûret-3** Hundirê Zîyareta Seyîd Bîlal 3



**Sûret-4** Paç/ Paçikên li Ziyareta Seyîd Bîlal



**Sûret-5** Ji Derve Zîyareta Seyîd Bîlal 1



**Sûret-6** Ji çalakiyên Zêw'ê



**Sûret-7** Hundirê Zîyareta Quba ZÎLAN 1



**Sûret-8** Hundirê Zîyareta Quba ZÎLAN 2



**Sûret-9** Ji Derve Zîyareta Quba ZÎLAN



**Sûret-10** Ji Dûr ve Zîyareta Quba ZÎLAN

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye‟de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Bitirme Projesi

# BATMANDA KUTSAL MEKÂNLAR

# (İKİ ÖRNEK/ SEYİT BİLAL VE ZİLAN ZİYARETLERİ)

Danışman

Yard. Doç. Dr. Necat KESKİN

M.Özcan ELEFTOZ

14721087

Mardin 2018